



Ev proje ji aliyê Yetiya Ewrûpa'yê ve tê finanse kirin.

HÛN BÊ DENGIYÊ DIBIHÎSIN?



TURİZMA
HEVALÊ
ZAROKA



INTERNATIONAL
CHILDREN'S CENTER

Li gorî daneyên UNISEF'Ê;
Di cîhanê her sal de kêr zêde
Mîlyonek zarok
ber bi fihûşê ve tê kaşkirin.

Piraniya zarokan ji ew kesên ku wan ji aliyê cînsî ve bikartînin ditirsin ku wê xerabiyê li wan li malbatên wan bidin. Ji ber vê yekê jî nizanin ku wê serî li kîjan meqamên fermî bidin. Zarokên wisa xwe bêçare hîsdikin. Hûn dikarin bibin dengê wan.

Hûn dikarin bibin dengê wan.



**FERQ BIKIN, BÊ DENGİYÊ
HÛN XERA BIKIN!**

Bazirganiya zarokan, binpêkirina mafê zarokan ya herî giran e. Tê vê wateyê ku ji aliyê hinek kes yan jî hinek koman ve bi pereyan an jî bi teşeyek din transverkirina zarokê ye

Ê KU VÊ SÛCÎ DIKIN KÎ NE Û RÊ Û RÊBAZÊN WAN ÇI NE?

Ew kesên ku wê, zarokên we yan jî zarokên li derdora we kedxwariyê dikin hinek rê û rêbazên cûda cûda bikartînin. Di nav wan rêbazên de gef xwarin, zordestî û xapandin jî he ye. Carnan jî ji bêçare mayînen wan zarokan bikartînin. Dibe ku di nav wan kesên kedxariyê dikin de xizmên zarokan yan jî nasên zarokan, kesên derdorê wan jî hene. Her wiha dibe ku ew kes bazirganiyên mirovan dikin an jî dibe ku komeke sûcdar be jî. Ew kesên sûcdar kîjan rê û rêbazan bikartînin. Hinek rê û rêbazên ew kesên ku kedxwariya zarokan ya cînsî dikin wiha ye;

- Malbatên ku rewşa wan yê aboriyê ne baş re dibêjin ku emê li zarokên we baş binerîn û wê zarokên we tu tengasiyê nekşînin.
- Hêwirîn (xwedîkirin), pere, diyariyên biha yan jî dayîna soza karekî
- Soza peyda kirina nasname û pelikê gerê.
- Soza derfetên derketina sînor ya derveyê welêt. Ji wan weke bi keşiyê an jî botên behre.
- Bi rêya zewicandina di temenê biçûk/pirzewac/hewitî jî di kedxwariya zarokan ya cînsî de tîrî bikanînin. Ev rêyan weke ku çandî didin qebûlînin.

KEDXWARIYA ZAROKAN YA CINSÎ BÎNPÊKIRINEKE MAFÊ ZAROKAN E Û SÛC E!

Kedxwariya zarokan ya cinsî; tê vê watayê ku carna nakît yan jî weke malekî bazirganî ji bo berjewendiyên hinekan tên bikaranîn. Mixabin zarok ji aliyê cinsî ve tên bikaranîn. Ev cûreyê kedxwariyê carna bi teşeyên cûr bi cûr derdikeve hemberî me.

- Kedxwariya cinsî
- Bikaranîna zarokan ya di pornografîyê de
- Kedxwariyê zarokan ya cinsî ji ser telefon û internetan
- Armancên bikaranîna kedxwariya cinsî ya beşa rêwîti û turîzmê
- Kedxwariya zarokan ya li ser internêtê
- Bi armanca bazirganî ve bikaranîna zarokan.
- Zewicandina bi zorê an jî bi dek û dolaban
- Zawecên di temenê biçûk de (li Tirkîyê 'emrê zewacê 18'in)
- Pirzewac û hewîtî (ev mekanîzmeyeke ne hemwaletîye û ne qanûnî ye jî. Nayê qebûlkirin)

**ÎSTÎSMARA CINSÎ Û KEDXWARIYA CINSÎ, PÊŞVEÇÛYÎNA ZAROKAN
YA PSÎKO-CIVAKÎ TÊKDIBE.**

BÛYEREKE TRAWMATÎK E!

- Mexdûr hîsên tirs, bêçare û fedîkirinê dijîn.
- Dibe ku ji bo pêşerojê xemên wan hebin.
- Ji bo qanûnan nizanin, nizanin ku wê ji ku alîkariyê bixazin.
- Ditirsin ku ew kesên ku vî sûcî dikin wê zerarê bidin malbat û heskirîyên wan.
- Dibe ku ji bo munesebeta cinsî tên zorkirin. Bi rêya cinsî hinek nexweşî hildigrin û dibe ku dûcaniyên ku axwazin jî çêdibin.
- Dibe bi zorê di cîhên ku ne li gorî wan de werin xebitandin.
- Dibe ku pêşveçûna hîsî, fizîkî û dişkan bandoreke neyînî bibîne




Komên Di bin Rîskê de:

- Zarokên di dema kamil bûyînê de
- Zarokên Mexdûrên şer
- Zarokên ku ji mafên perwerdehiyê kêmanî
- Zarokên bê xwedî (zarokên ku ji malbata xwe cûda mayî)
- Zarokên ku rewşa wan yê aboriyê ne baş
- Zarokên dixebitin/ji bo ku bixebitin tî zorkirin/zarokên ku di kolanan de bi zorê parsekiyê dikin
- Di dema gîhanê zarokên ku ji aliyê fizîkî û mejî ve cûda
- Zarokên ku bûn mexdûrê sûcan û ê ku sûcdar hatinkirin.
- Di malekê de jiyandina ji kesekî zêdetir

Rewşên Bi Guman Ya Zarokên Di Bin Rîskê De

- Zarokên nizanin, nikarin xwe bidin nasîn ya ku li kuderêne
- Zarokên ku ji parvekirina agahiyên di derbarê xwe yê şexsî de ditirsin yan jî şerm dikin
- Zarokên ku li ba mezinekê an li ba jî mirovên gihîştî xwe nerehet û bê aram hîsdikin
- Zarokên ku nasname û pelikên wan yê rewîtiyê nîne.
- Dema ku mirov ji zarokê di derbarê wî de agahiyeke pirs dike, weke ku zarok çîrokeke berê hatiye tembe kirin vedibêje.
- Zarokên ku weke xwe bê xwedî xûya kirin didin, lê zarokên ku bi miroveke gihîştî re rewîtiyê dikin
- Hinek mirovên gihîştî jî weke ku bê bira an jî bê meriv rewîtiyê dikin xûyakirin didin.
- Lê ew kesên ku bi zarokeke zêditir re rewîtiyê bike
- Zarokên ji aliyê malbatên wan ve bi zorê hatin zewicandin
- Zarokên ku mirov pirseke jê dike kesên gihîştî ya li ba zarok bibersîvîne
- Dema ku mirov diçe serdanekê, tê zanîn ku di wê malê de zarok heye lê xûya neke



DEMA KU MIROV BI REWŞEKE BI GÛMAN RAST WERE, LI GOR ZAGONÎ MIROV MECBÛRE KU JI RÊVEBIRAN RE BIBÊJE!

Hûn Dikarin Çi Bikin?

- Ji bo ku hûn bi zarok re têxevin têkiliyê divê pêşiyê xwe bidin nasîn.
- Ji bo ku hûn agahiyêke bistînin, dîrek ji zarokan pirsra nepirsîn.
- Dema ku we gumaneke bi hêz dît heman demê de li 155 an jî 157 bigerin. Yan jî hûn dikarin herin navenda ewlekariya herî nêz.
- Heta ku hêzên ewlekariyê werin li cem zarokan bin û li ewlebûna wan bawer bibin!(ji kesê bi guman dût bixin)
- Di vê demê de piştgiriya bidin zarok û ji tevgeriyên ku wan sûcdar dikin dût bisekinin.
- Hûn dikarin bi Rêxistina Penaber ya Neteweyên Yekbûyî (UNHCR)(444 48 68) yan jî bi Saziyên Civakî ya Siwîl re têkevin têkiliyê.

Agahiyên Ragihandinê û Mekanîzmayên Serlêdanê: **BÊ DENG NEMÎNIN!**

Dema ku we rewşeke bi gûman dît, hûn dikarin ev beşên dadî bigerin.

- **155**- Polîs Hawar
- **156**- Cendirme (cihên ku derveyê bajar, navçe û cihên ku polîs lê nînin.)
- **183**- Xeta Alîkariya Civakî
- **112**- Xizmetên Tendûristî Ya Lêzgîn

157- Navenda Ragihandina Bîyanî (YÎMER)

YÎMER bi Tirkî, Ingilîzî, 'Erebî, Rûsî, Almanî û farisî 7 rojan û 24 seatan xizmet dide. Ev sazî alîkariya kesên biyanî û ji aliyê destura îqamêya navnetewî, parastina demî de alîkariyê dide. di mijara bazirganîya mirovan de xelaskirina mexdûrên mirovan de jî gelekî alîkariyê dide.

444 48 68- UNHCR-SGDD (Komeleya Piştgiriya Koçberan û Penaberan) Xeta Şêwirmediyê

Li Tirkîyê ji bo penaberan û koçberan bi zimanê 'Erebî, Ingilîzî, Farisî û Tirkî xizmet dide. Rojên Duşem û Pêncşemê ji seat 09:00 heta 17:00'an roja îne jî ji seat 09:00 heta 16:00'an xizmet dide.

168- Xeta Alîkariya Lezgîn Hêyvasor Ya Tirk

Bi Zimanê Tirkî, 'Erebî, Ingilîzî, Farisî û Peştû xizmet dide.

Dema ku hewcedariyên we bi alîkariyê hebe

hûn dikarin bi van saziyên li jê hatiye hejmartin re jî têkevin têkiliyê

- Revebirên Navend Wezaretê Xizmetên Civakî û Xebata Malbatê
- Rêvebirên Navend Rêvebirê Gelemperî Îdareya Koçê
- Ewlekarî-Cenderme
- Serokatîyên Daîreya Karên Alîkarî ya Civakî yê Şaredariyan
- Serwîsên Xizmeta Civakî yê Nexweşxaneyan
- Komeleya Piştgiriya bi Penaberan û Koçberan (SGDD)
- MUDEM (Komeleya Piştgiriya Penaberan)
- Komeleya Piştgiriya Jîyanê
- Komeleya Piştewaniya û Piştgiriya, Alîkariya Penaberan (Stenbol)
- Hêvasor a Tirk
- Baro
- IOM Ofîsa Piştgiriya Penaberan ya Şîrîkî Weqfên (Ruha)
- Piştgirî, Alîkarî ya Civakî yê Şaredaran
- İKGV- Weqfa Pêşvebirina Çavkaniyên Mirovan
- Navendên Tendûristiya Penaberan
- Muxtar
- Mele



Ev weşan bi piştgirîya finansî ya Yekîtiya Ewrûpa'yê ve hatiye çêkirin.
Naveroka weşanê tenê di berpîrsiyariya Navenda Zarok ya Navnetewî de
ye. Û ev weşan ne nêrînên Yekîtiya Ewrûpayê

